Kurdî - Kurdisch

# **Veqetendinê rahettir bike.**

Hûn dê li vir hîn bibin çi bi çopan bikin.



www.usb-bochum.de



## çopavêtina durist ji bo me girîng e.

**Çerxa materyalê tenê bi veqetandin û vezîvirandina rast a çopan dikare kar bike. USB bi salan e li Bochumê li ser tunekirina çopan mijûl e û di mijara veqetandina çopan da mixatebê we yê pispor e. Me ji bo her daxwazekê çareseriyeke guncav heye.**

**Veqetandina çopan bi wateya parastina nirxê**
Materyalên xav ên giranbiha ye – ev e ya ku vezîvirandinê ji her demê girîngtir dike. Beşeke mezin a bermahiyên malê ji plastîk, metal, cam, kaxez û bermahiyên organîk pêk tê.Ev tişt hemû dikarin bibin bingeh ji bo tiştekî nû û bi vî rengî çavkaniyên xwezayî werin parastin. USB Bochum GmbH ji bo veqetandina çopê xizmetên cihêreng pêşkêş dike. Helbet pêdiviya me bi alîkariya we jî heye. Di vê broşûrê de hûn dikarin bixwînin ka ji bo misogerkirina xebitîna çerxa materyalê hûn dikarin çi bikin.


Hûn dikarin li ser malpera www.usb-bochum.de
xwe bigihînin me

# Naverok

xizmeta cureyên çopdankan: veqetandina çopan hêsantir dike

| | |
|---|---|
| xizmeta qismî yan tam | rûpela 4 |
| çopdankên çopên malê | rûpela 5 |
| kaxezên kevn | rûpela 6 |
| çopdankên vezivirînbar | rûpela 7 |
| çopa alavên mezin | rûpela 8 |
| Çopên mezin ên serhêl | rûpela 10 |
| Çopdankên çopên bîo | rûpela 12 |
| Şînkahî | rûpela 15 |
| Çopên elektrîk û elektronîkê | rûpela 16 |
| Konteynerên camê | rûpela 19 |
| çopên zêdetir | rûpela 20 |
| xizmeta konteynerê | rûpela 21 |
| qutiya komkirina tiştên malê | rûpela 22 |
| devikê şûşeyan yê darîn, CD û DVD | rûpela 23 |
| agahî ji bo pêşîgirtina çopan | rûpela 24 |
| Çalakiyên USB ji bo pêşîlêgirtina çopan | rûpela 27 |
| dayîna termînan ji bo navendên vezivirandinê | rûpela 28 |
| navendên vezivirandinê | rûpela 30 |
| çopên kêşesaz | rûpela 31 |
| kartên kolanan û pirsên ku herî zêde tên kirin | rûpela 32 |



## Hertim tê bikaranên: Xizmetên me yên qismî û tam

**Çopdankên cihêreng li ser du kategoriyên karî têne dabeşkirin: çopdankên bermayî û çopdankên organîk dikevin nava kategoriya tam, û çopdankên vezîvirandinê û yên kaxezê dikevin nava kategoriya qismî.**

### Xizmeta tam bi vê wateyê ye:

Hemû çopdankên bermayî yan çopdankên organîk ji hêla USBê ve tên komkirin û dîsa tên vegerandin. Çopdank dikarin 10 mitreyan dûrî xeta milkê li ser riya giştî be. Heger ev rê ji 10 mitreyan zêdetir be USB heqekî zêdetir dixwaze ji bo komkirina van çopdankan. Nexasim, divê riya veguheztinê û cîhê çopdankan di guhertoya heyî ya derbasdar de hewcedariyên qanûna çopê ya bajarê Bochum bicîh bîne.

### Xizmeta qismî bi vê wateyê ye:

Hûn çopdankê herî dereng heya saet 6:00 şefeqê ji bo valakirinê li ser peyarêyê deynin, heger ev yek ne mumkin be hûn dikarin wan li kêleka kolanê ya malê deynin. Xizmetên tam ên bipere dikarin li ser daxwazên we werin reservekirin.
**Wekî xwedanxanî, hûn dikarin daxwaza xwe bi awayekî nivîskî bo veguheztina ji xizmetên qismî bo xizmetên tam radestî USBê bikin.**
**Koda QRê berê we dide malpera, ku tê da lêçûnên zêde wek lîstekê tên dîtin.**

**Ji kerema xwe baldar bin:** kolan divê beton an asfaltkirî bin û ji berf û cemedê jî hatibin paqijkirin. Firehiya rêyên veguheztinê herî kêm divê 1,20 m be.



## Çopdanka me: hertiştî di xwe da dihewîne

**Çopên malê yên ku êdî ne zivirînbar in dikevin nava çopdankê. Ew bi awayekî li fabrîkeyên şewitandina çopan tên şewitandin û bo elekterîk û enerjiya germayê tên veguhztin.**

### Ev dikevin çopdankê:

- Xwelî
- Bermayiyên pêlîstokan
- Çarçoveya wêneyê
- Tiştên paqijiyê yên jinan
- Şûşe, şûşeyên taybet, neynik
- Wêne
- Firaqên sikestî
- Lampe (ne lampeyên kêmmesref)
- Bermayiyên plastîk û çermî
- Kaxezên malê
- Bermayiyên paqijiya mal yan kolanê
- Berhemên paqijiyê
- Seramîk
- Mûm
- Kartrecên tonerê yên vala
- Kîsên vala yên çîmentoyê
- Derman
- Porselen
- Potikên paqijiyê
- Destmal
- Bermayiyên mewadên xwarinê
- Sureng (derzî, dikevin qutîkên ku derzî tê ra derbas nebin)
- Karton û kaxezên pîs
- Materyalên vezivirînbar yên pîs wek fîncan û tiştên têda
- kîsên tozmijê
- Gore
- Bermayiyên heywanan
- Kaset û bandên vîdeoyan
- Materyalên pansimanê
- Xîzê balindeyan
- Paçikên zarokan
- Bermayiyên cixareyê

### Heger çopdanka organîk tunebe, herwisa:

- Çopên mitfaqê û yên organîk (wek qaşilên kartol û giyayan)

### Têbîniyên me ji bo çopdankan:

**Gelo çopdanka we gelek caran tijî nîne yan jî zêde tijî dibe?** Xwedanxanî yan jî berpirsên xaniyan dikarin bi awayekî nivîskî bo guherîna mezinahiya çopdankê ji bo USB binivîsin an jî li ser înternetê bi awayekî online li vir sparişê bidin: www.usb-bochum.de/behaelterbestellung

**Hemû tarîxên valakirinê di binê koda QR ya jêrîn de têne dîtin.**



## Ji bo xatirê jîngehê: Komkirina çopa kartonên kevn çar heftiyê carekê

**Çopa kartonê kevn materyala herî girîn ji bo çêkirina kaxezê nû ye. Çêkirina kaxêzê ku dîsa tê biakranîn kêmtir av û enerjiyê ji çêkirina kaxêzê nû xerc dike.**

### Ev tev dikevin çopdanka şîn ya kartona:

- Dosyayên ji kaxez
- Pirtûkên bê berga ji plastik
- Karton
- Katalog, pirtûka telefona
- Pakêtên tiştên xwarinê yên paqij
- Kaxezê ku mirov tiştan pê dipêçe
- Kîsên kaxezî
- Karton
- Kartonê pitzayê
- Prospektên dikana (bê plastik)
- Qutîkên kartonî
- Kartonên leyistokan bê parçeyên plastîk
- Pakêtên postê
- Kartonê dermanê cilan
- Kovar û rojname
- Pakêtên şekir û arvan

### Ev nakevin çopê:

- Kaxezê firinê
- Wêne
- Desmalên hîjenik
- Kaxezên şîn û yên komirê
- Kaxezên qirêj, kaxezên stûr, karton
- Kaxezên dîwarî û jibermayinên kaxezên dîwarî
- Qutîkên ava vexwarinê
- Paçik [zarokan]

### Agahîyên derheqê kaxezên kevn:

Hîn jî qutîkên ji kartonan (wek yên masî, pîtza yan jî yên îspenaxê) dikevin çopdanka vezivrînbar. Alîkariya me bikin ku karton bi qaliteyeka herî bas dubare were bikaranîn, lewra qutikên xwe yên kartonî bavêjin çopdanka şîn.

**Hemû tarîxên valakirinê di binê koda QR ya jêrîn de têne dîtin.**



**Hûn dikarin li ser malpera www.usb-bochum.de xwe bigihînin me**



## Tevlihevkirina aqilane : Çopdank an jî kîsên çopan ên vezivirînbar:

**Qutîk û tiştên plastîk û hesinî dikarin bikevin çopdanka hevpar a vezivirînbar an jî dikarin di kîsên palstîk ên vezivrînbar de werin komkirin û paşî werin cudakirin û bikaranîn.**

### Ev madeyên plastikî dikevin çopdank û kîsên vezivrînbar wek mînak:

- Guldank (ne yên seramîk)
- Satil
- Pêlistokên zarokan
- Dosyayên ji plastîk
- Folyoyê paqij (yên ku meriv deytîne ser tiştan)
- Qutîkên plastîk yên paqij
- Qutîkên barkirinê
- Kîs û folyo

### Ev hesin dikevin çopdank û kîsên vezivrînbar wek mînak:

- Aluminyum û aluminyumfolyo
- Amûr
- Firaqên firinê
- Qutîkên konservan
- Tawe
- Biroş
- Paketa ava bacanan

### Ev paketên bi yan jî bê xalên kesk wek nimûne di çopdanka vezivirînbar da yan jî kîsên vezivirînbar da cih digirin:

- Satila mastî
- Paketên plastîk (çêkirî)
- Paketên hesinî (metal)
- Qutîkên dermanên paqijiyê
- Styrofoamên amanên elektronîk yan jî mêweyan
- Tetrapek (vexwarin û kartonên şîrî)

**Tişta girîng di derbarê çopdank û kîsên çopa plastîka de:**

Çenteyên vezîvirandinê tenê li dijî koda QR. Hûn ê vê yekê piştî ku temam bikin bistînin Qeydkirina di portalê xerîdarên me de li www.usb-bochum.de/kunden-portal.

Li vir portala xerîdar e:



## Alavên mezin bavêjin: Termina çopa alavên mezin

**Alavên malê yên ku nakevin çopa malê, dikarin salê carekê ji aliyê USB – Xizmeta derûdora Bochumê ve werin birin. Di broşura USByê ya „Heyfe ku were avêtinê“ de hûn dikarin hinek ciyên li Bochumê bibînin, daku alavên kevn ji çopa alavên mezin werin xilaskirin.**

### Hûn dikarin çopa alavên mezin qeyd bikin:

- Akvaryom
- Textekar
- Textê razanê
- Komputer û monîtor
- Amûra hilmkêş ya mitfaqê
- Kursiyên sê kuşe
- Duçerxe
- Telvezyon
- Mobîliyayên baxçeyê
- Amûrên nava malê (tozmirj, firne, cilşok, cilhişkker, hwd.)
- Erebeya zarokan
- Mobîliyayên biçûk (komod, neynik)
- Valîz
- Amûrên sarker
- Doşek
- Mobîlîayên metal
- Mîkrovele
- Mobîliya bi parçeyên elektronîk*
- Klaviye, piyano
- Ref
- Dolab
- Palgeh
- Sofa
- Ferş, ferşên zelqokî



Hejmara telefonê ji bo çopên mezin:
0800 1995900 // sperrmuell@usb-bochum.de

## Ev ne çopên mezin in:

- Batarî
- Cilên kevn
- Jalosên derveyî, pencere, derî, parçeyên erebeyê (teger, tavan hwd.)
- Hewzê serşokê
- Dar, kuçik, kaxezên îzolasyonê, kevir Madeyên,kîmiyayî, lak, reng
- Kabîna dûşê
- Têlên hewşeyê
- Çopên malê
- Kalorîfer, Kalorîferên bi rûn
- Sobe
- Lamînat, panel (poşişa dîwar û tawanê)
- Kevirên towaletê
- Destşok

* Agahiyên zêdetir li rûpela 16 yan jî li vê lînkê peyda bikin.

## Avêtina çopa alavên mezin:

### Bi qiyasên normal yên malê heta 2 metrekubê de:

Birina çopê bi erebe an ji rimoqan ne pêkan e!

- Wattenscheid, Blücherstraße 53 max. 1,00 m
- Bochum-Werne, Brandwacht 49 max. 1,00 m
- Bochum-Linden, Am Sattelgut 132 max. 1,00 m

### Miqdarên zêde û mobilyayên mezin:

- Wertstoffhof Havkenscheider Straße

## Bi tenê çend klîk randevûyên çopê yên mezin tomar bikin

Bi tenê çend klîk, randevûyên çopê yên mezin dikarin zû bêne çêkirin
Û bi bandora girêdanê bêne qeyd kirin.

Bi rêya girêdana www.usb-bochum.de/sperrmuellbestellung
Piştî peydakirina nav, navnîşan û têkiliya xwe
Tiştên çopê yên mezin û bi guncan hilbijêrin
Hejmara tomar bike.


Sistem bixweber tarîxên hilgirtina gengaz pêşniyar dike.
Giring! Piştî hilbijartina tarîxê, ji kerema xwe bawer bin
E-maîl kontrol bikin û randevûyê piştrast bikin.
Tenê dema ku pejirandin bi riya girêdana
di nav de Emaîl  randevû tê rast kirin.
Carekê tenê Her malek Bochum dikare
her sal y Serlêdana berhevkirina Çpopê
yên mezin ên belaş bikin.



Çopên mezin bi taybetî tê de hene
Tiştên malê û mobîlya
Malên taybet, ku ji ber mezinbûna xwe,
giranî an mîqdara wan
pêşkêşî çopên fit û
ji ber vê yekê di çopên bermayî de nayê avêtin.

Qeydkirina bi telefoonê li dema
Saetên ofîsê li ser hejmara karûbarê belaş
0800 1995900 gengaz e.


Startseite – USB Bochum GmbH
Info & Service
Bildungsbereich
Karriere
Wohnanlagen
Presse
Kontakt
SPERRMÜLLBESTELLUNG
* Einträge in diesen Feldern sind erforderlich.
Anfallstelle
Straße Hausnummer *
Weiter zu Auftraggeber


Alles BIO für die TONNE
GIB MIR DEN REST!
BIO TON NE



## Bi hêviya zêdebûnê: Çopdanka biyolojîk

**Çopên organîk di bîdonên organîk de cihê tên berhevkirin da ku ew ji çopên din werin veqetandin û di kargehên biyogazê de werin vezivirandin.**

### Ev dikevin çopdanka biolojîk ya bi rengê qahweyî:

- Dar û çuqlîkên jêkirî
- Erda gulan
- Gul û giya (bê guldank)
- Nan û pasteyên ji ber mayî
- Qaşilê hêkan
- Pirtik
- Masî û goştî ji ber mayî
- Por
- Binê qahwê û kîsê filterê
- Pelên dara
- Fêkî û sebzeyên ku ji ber mayî
- Giyaya jêkirî
- Arvanê textê ku hîn nehatiye bikaranîn
- Jibermayînên xwarinê (di kaxezê rojnamê de)
- Kîsê çay
- Baharatên berî

### Ev nakevin nava çopê:

- Xwelî û qunikê cixara
- Folyo û kîsên plastîk
- Komir
- Xweliya kolanê
- Qesel, pîsitiya heywana
- Qutîkên ji madeyên giyayê
- Qundax

**Çopa şînkayiyê û ya bexçe dikarin bêheq li her ciyê çopa plastîka were avêtin. Çopa mitfaxê bi tenê bi heq dikarin li Wertstoffhof Havkenscheider Straße werin avêtin.**

### Pêşniyarên ji bo çopdanka biyolojîk:

- Kaxezê rojanmeyê deynin binê çopdankê
- Jibermayinên xwarina zuha bihêlin
- Jibermayinên xwarinan di kaxezê rojnamê de bipêçin
- Çopdankê girtî bihêlin
- Bi dermanê firaqa her car çopdankê bişon
- Sirkeyê biresînin ser devikê çopdankê û xwarina di nav de an jî arvanê kevir an jî yê daran li ser bireşînin
- Dema pêwîst bû dermanê mikro noyolojîk yê çopdanka çopê û çopdanka çopa biyolojîk tê pêşniyarkirin.

# Tu jî qebûl dikî ku wisa ye. Peredana bi kartê her tiştî hêsan dike.

Li ciyê me yê çopa plastîkan yê li Havkenscheider Straße (am Harpener Watt) hûn dikarin bi rihetî bi kerdê bankayê pere bidin.





## Baş hate kontrolkirin: Ya zêdetir ji bo çopên kesk

**Hûn dikarin çopa xwe ya bexçe her dem bibin ciyê çopa plastîka teva. Di sezona bexçeyan de em ciyekê cûda ji bo şînkayiyên ku hatine jêkirine amade dikin.**

### Komkirina şînkayiyên ku hatine qutkirin:

**Em dikarin ji biharê heta payizê şînkayiyên we yên qutkirî ji duşeman heta înaa ji saet 10:00 – 17:00 und rojên şemiyê ji saet 10:00 – 15.30** li Bergener Straße 59 in Bochum-Hiltrop wergirin. Ji kerema xwe re agahiyên di derbarê dema girtinê di înternetê de bixwînin.

Dema USB Bochum di bihar û payizê de ciyekî keskayiyên qutkirî yê sezonî veke, wê ev agahî di çapemeniyê de bê ragihandin. Agahiyên zêdetir di derbarê dem û terminan hûn dikarin li ser hesabê vî hesabî jî bistînin **www.usb-bochum.de**.

### Em li gorî qiyasên normal yên malê van tiştan werdigrin:

- şaxê daran
- birîna daran (kezax)
- qurmê daran heta navgîn 20 santîmeter qalindî û 1 metre jî dirjahî
- şax û balên daran
- pelên daran
- çîmen
- koka daran bi qalindiya heta 20 santîmetreyan

### Em van hilnagrin:

- axa guldankan
- çîmen
- axa sethî

Piştî ku cihên berhevkirina çopên kesk hatin girtin, rijandina çopên şînkahiyê yên bejayî qedexe ye. Binpêkirina vê yekê dikarin bi pereyê were cezakirin.

**Agahî:**

kîsên çopên şînkahî yên saxlem bi qiyasa 200 lître li rêveberiya USB, Hanielstr. 1, her yek bi 2,50 € dikarin werin kirîn.



## Li gorî beşa xwe bêne avêtin: alavên elektronîk - kevn û mobîlyayê bi perçeyên elektronîk

**AEG*yên ku hew bi kêr tên divê bi çopa bermahiyan re neyê avêtin, ji ber ku di çopên elektronîk de gelek caran jehriyên hawirdorê yên wekî rêber û asbest hene. Di heman demê de alavên elektronîk gelek madeyên ku dikarin werin vegerandin hene. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe alavên xwe teslîmî navendên me yên vezivirînbar bikin da ku li gorî beşa xwe werin avêtin. Mobilyayên bi perçeyên elektronikê ji tebaxa 2018an ve li gorî ElektroG wek alavên kevn yên elektronikî tên avêtin.**

**Hûn dikarin li depoyên vezîvirandinê yên Bochumê cîhazên elektronîkî yên jêrîn belaş rades bikin:**

- Mobîlye bi hêmanên elektronîk
- Antên, duşaxên serê kabloyê û adapter (ji Gulana 2019an ve mecbûrî ye)
- kamerayên dîjîtal
- lampeyên kêmmesref
- cîhazên malê yên mezin ên wekî cilşok, ocax, firneyê
- cîhazên malê yên piçûk ên wekî toster û otûyê
- cîhazên IT û monîtor û her weha PC, prînter û telvezyonê
- cîhazên sarkirinê yên wekî sarinc û cemidandinê
- Lampeyên florsentê yên wekî lûleyên neon, lampayên UV
- Telefonên baqil, heger mimkin be bê batarî û bê dane



Hûn dixwazin ku  alavên mezin yên cemedê û alavên mezin yên malê an jî mobîlyayên bi parçeyên elektronîkî werin hilgirtin? Termînekê bi servîsa çopa alavên mezin re çêbikin. Alavên elektronîk û mobîlyayê bi parçeyên elektronîkî divê ji çopên din yên alavên mezin were cudakirin.

**Agahî:**

Em AEG*yan bi tenê li gorî qiyasên normal yên malê werdigrin. Mobîlyayên bi parçeyên elektronîkî (palgeha masajê, dolabên eynê yên bi lempe, textên razanê yên elektronîk hwd.) dikarin di dema avêtina bi xwe de bi tenê li navenda vezivirînbar ya li Havkenscheider Straße were avêtin.

AEG* (alavên elekterîk û kevn)

**Agahî:**

Ji tîrmeha 2022an ve divê dikan û supermarketên tiştê xwarinê jî alavên kev - elektronîkî belaş wergirin. Rêgezên di derbarê vê de hûn dikarin li ser vê malperê bibînin www.elektrogesetz.de.



# Pir tişteki aqilane ye! Wisa bê kîs!

Hûn jî derbasî çopdanka vezivirînbar bibin!
Tişteki paqij e!



## Parastina - madeyên vezivirînbar: konteynera me ya camê

**Tunekirina camên kevn di destê firmeya RAU GmbH de ye ku girêdayî firmeya USBê ye. Ji bo çerxa madeyên vezivirînbar bê pirsgirêk kar bike, bi giştî 300 ciyên konteynerê bi texmînî 800 konteynerê camî hatine danîn.**

### Ji bo xatirê cînar û jîngehê

Di dema avêtina camên kevn de, bi taybetî dema gelek cam bin, deng her heye. Ji ber vê yekê ji kerema xwe re camê xwe yê kevn ji bo xatirê derdorê di rojên kar de di navbera saet 7:00 û 20:00 de bavêjin.

### Ev dikevin konteynera camî:

- şûşeyên tirşiyê (vala)
- şûşeyên parfûmê
- şûşeyên tiştên vexwarinê
- şûşeyên konservê yên vala
- şûşeyên din

**Şuşeyên bi reng, yên ku hûn nizanin dikeve kîjan konteynerê ji kerema xwe re bavêjin konteynera camên kesk.**

**Ev nakeve nav konteynerê:**

- krîstalên zirêç
- camên pencereyê
- cam û şûşeyên ku di deve konteynerê re derbas nabin
- lampe
- silehî
- sermîk
- berçavkên obtîk
- porselîn
- devik
- kase
- camên taybet
- camên neynikê
- Trinkgläser

ji kerema xwe vina bêxin nava çopên bermayî
**Ji kerema xwe re lempeyên dirêj û lempeyên ku enerjiyê kêm xerc dikin bidin navendên vezivrînbar.**

**Çavlêgerandina ya hemî cihên Depocontainer dikare di bin koda QR ya jêrîn de were dîtin.**



## Dema ku zêde bibe: çopên zêdetir

**Dema ku çopa malê ji gorî qiyasên normal yên malê zêdetir be wek mînak piştî pîrozbahiyekê an jî karên paqijiyê, ev derfet ji bo we hene:**

### Bixwe anîn
Hûn dikarin çopa malê ku di bin 2 $m^3$ hecimî de be bi heq li navenda vezivrînbarê ya li Havkenscheider Straße bavêjin.

### Bihêlin kesên din wan hilgirin
Hûn dikarin wek altenativ çopa malê ya zêde bixin kîsên çopê yên bajêr (yeka wê bi 2,50 EURyî ye) û wê çopê deynin kêleka çopdanka xwe ya çopa malê daku ku were birin. Ciyê firotina kîsên çopê yên bajêr hûn dikarin li ser malpera me ya internetê **www.usb-bochum.de** bibînin an jî **telefonî vê hejmarê bikin 0800 3336288.**

### Çopdankên semîneran ji bo pîrozbahî û cejnan
Ji bo rojên wisa bi hêsanî çopdankeke semînera bixwazin. Bi kêfxweşî em vêya bi fiyeteke giştî didin we. Bê çêkirina peymanekê telefonî me bikin an jî ji me re faksekê bişînin.
**Tel. 0234 3336-243 // Fax 0234 3336-209**

### Şêwirmendiya çopavêtinê
Pirsên we di derbarê avêtina hinek çopan an jî di derbarê kêmkirina çopê de heye? Wî wextî xwe bigihijînin beşa şêwirmendiya çopavêtinê. Karmendên beşa şêwirmendiya çop avêtinê ji **duşemê heta pencşemê ji saet 8:00 heta 18:00 û înê ji saet 8:00 heta 15:00** ji bo we amade ne.
**Telefon 0800 3336288 // Fax 0234 3336-279**
**Forma têkiliyê  www.usb-bochum.de/kontakt**
**E-Mail: abfallberatung@usb-bochum.de**



## Ji bo yên hişk û mezin: Xizmeta konteynerê USB Service GmbH

**Bi taybetî di xebatên avakirin, nûkirina xaniyan û bexçevaniyê de gelek çop çêdibin. Li virê konteynerên mezin pêwîst in. USB ji bo wan pêşniyarên xwe yî baş hene.**

### Konteynerên heta 10 $m^3$

Konteynerên ku kapasîta wan heta 10 $m^3$ bin bi hêsanî dikarin bên veguhestin û dikarin ji bo armancên taybet bên bikaranîn. Konteynerên bi 2, 5, 7 û 10 $m^3$ bi an jî bê devik dikarin werin xwestin. Konteynerên ku deriyê wê yî ajotina hundir heye em bi mezinahiya 5 û 7 $m^3$ belav dikin.

### Konteynerê heta 33 $m^3$

Konteynerê bi mezinahiya 20 û 33 $m^3$ dikare çopên mezin hilgire û ew piranî ji bo pêwîstiyên bazirganiyê tên bikaranîn. Ji bo wan konteyneran cî lazim e daku bikarin wê konteynerê bilivînin û deynin ciyekî.

### Ev konteynera çopê ye:

- **Çopa inşaatê ya tevlîhev:** dîwarên kilsê, bermahiyên daran, plastîk û bermahiyên kaxezê dîwaran
  **Xweliya inşaatê:** madeyên mîneralî wek kevirên dîwaran, kelpîç, kelpîçên pahn ên ser banê, beton, seramîk û kaşî, beton û bermahiyên paqijiyê, destşok û towalet
  **axa kolandî:** ax û axa sethî, herî, xîz, kevir û qûm
  **çopên zibilbar:** pel, çîmen û çopên şînkahî, şax û qurmên daran

**Têkilî û siparişdan:**
Xizmeta Konteynerê ya USB ji **duşemê heta înê ji saet 7:00 heta 16:00** ji we re vekiriye:
**Tel. 0234 3336-212 / -215 // Fax 0234 3336-220**



## Ji bo rewşên taybet: Qutiya komkirina tiştên malê

**Çi bikin ji bataryayên vale û lempeyên kêmmesref? Ev nikarin di çopa malê de werin avêtin, ew divê cûda werin avêtin. Qutiya komkirina tiştên malê komkirina çopa vezivirînbar li we rihet dike û wan çopan bi lez û bawerî vedigerîne çerxa vezivirînbariyê.**

CDê, DVDê, batarya (yên xira nebûyî an jî ne rijyayî), lempeyên kêmmesref, LED û devikên şûşeyan ên darîn dikevin qutiya xweşik û pratîk. Dema ku qutîk tije bibe, hûn dikarin wê belaş li her ciyê çopa vezivirînbar ya bajarê Bochumê bi qutiyeke nû biguherin.

Her qutiyek sê devên xwe yên cûda hene, ji bo sê çopên cûda yên vezivirînbar. Hûn dikarin bixwe biryar bidin hûn kîjan çopê bixin kîjan devê qutiyê (wek mînak beşek ji bo devikên şûşeyan yên darîn) û hûn li gorî çopa we xistiyê de li ser qutiyê kifş dikin.

Hûn dikarin qutiya komkirina tiştên malê bi dizaynên balkêş li her navêndên vezivirînbar yên Bochumê bistînin. Ew li nevenda xercan ya Bochumê li Große Beckstraße 15 li ba USB li Hanielstraße 1. ne.

### Pirberhevker:

Xizmeteke teknîkî ya cûda li Şaredariyan ji we re amade ye Hans-Böckler-Straße 19. Ev qutiya berhevkar ji we re avêtina van alavên malê hêsantir û leztir dike:

- CD û DVDêyan
- Hibra prînterê
- devikên şûşeyan yên darîn
- Kabloyê şarjer bi û bê parçeyê netê



## Girîngiya Berhevkirinê: devikên şûşa yên darîn

**Pêwîstiya devikên şûşeyên darîn ji bo hilberîna xwezayî her diçe zêdetir dibe û êdî bi zêdebûna xwezayî nikare bê têrkirin. Heta niha bi tenê yek ji deh devikên şûşeyan ên darîn di çerxa madî de tê tevlîkirin. Alîkariya me bikin daku em tevlîkirina wê zêdetir bikin.**

Ji kerema xwe re bi tenê devikên şûşa yên darîn ê xwezayî yên şerabê û yên şûşeyên alkolê kom bikin. Ji bo wê qutiya me ya komkirina tiştên malê bikar bînin. Ji bo hejmareke zêdê hûn dikarin kîsên potik yên ku hewayê derbas dikin an jî plastîk bikar bînin. Devikên şûşe yên darî ku we komkirine bidin navendên vezivirînbar li navenda xercan an jî li ba USB li Hanielstraße. Hejmareke zêdê ji kerema xwe re rasterast bînin Hanielstr. 1.

## Ev tişt nakevin çopdankê: CD û DVDê

**CD û DVD dikarin ji bo berhemên xwedî kalîteyeke bilind werin bikaranîn - dema ku ew li çerxa vezivirînbar were dayîn. Qutiya komkirinê ya malê ji bo komkirinê guncav e.**

**Li kû tê berhevkirin?**
Hûn dikarin CDê û DVDyên yekane bidin navênden me yên vezivirînbar, ciyên îdareyên herêmî her wekî din bidin navendên xercan yê li Bochumê. Hejmarên mezin ji 20an zêdetir ji kerema xwe rasterast bînin navenda vezivirînbar a USBê. Qalibê plastikî dikarin di çopdanka plastikê de werin avêtin.




## Rêgirtina li ber çopê - gava yekem ber mayindebûnê ve

**Armanca sereke ya siyaseta îsrafê rêgirtina çopa zêde ango dîsa bikaranîna çopê ye. Divê çerxa aborî zenginiyên xweyazî biparêze û di zêdekirin û dîsa bikaranîna çopê de mirov û jîngehê biparêze.**

Mirov çawa dikare zihniyeta avêtinê û xerckirina zenginiyên erdê bi kêmkirina çêkirina çopê re biguhre?

Di bin sernivîsa “programên pêşîgirtina çopa zêde” li hemû dewletên endamên Yekitiya Ewropayê çalakî û tedbîr hene. Em ê li vê derê hinek fikrên ku her kes dikare di jiyana rojane de bi cîh bike, nîşan bidin:

- **Heta ji we tê kêm berhemên bi pakêt bikrin,** ji ber ku berhemên bi pakêt û folyoyên helandî gelek çopê çêdikin. Tiştên teze weke sucuk, goşt û penîr dikarin di qutîkên xwarinê de werin birin.
- **Ji bo danûstandinê selik, kîsên potik û kitanî di şûna kîsên plastîkan de bi kar bînin.**
- Xerckirina kaxezan dikarin werin kêmkirin, dema mirov **bi herdu aliyan kaxeza çap bike.** Her wiha kaxezên vezivirînbar bikrin, ji ber ku piraniya wan kaxezan ji kaxezên kevn tê çêkirin.



- **Li ciyê kevna mirov dikare cilan, mobilyayên malê û tiştên destê didoyan bikre an bifroşe.** Bazirganiya li ser internetê jî heye.

- **Bi lîsteyekê biçin danûstandinê yan jî** bernameyeke xwarinê ji bo heftiyê amade bikin. Hûn ê bikevin ferqê ku kêmtir xwarin ji ber dimîne. Ji bo tiştên ku ji ber dimînin fikrên USBê yên baş di pirtûka xwarinan de heye.

- Bi tenê tiştê ku hûn di dema xwe de bikar bînin bikrin.

- **Pakêtên ku dûbarê dikarin werin bikaranîn hem mesref û hem jî çopê kêm dikin:** gelek caran dermanê paqijiyê û berhemên hijênîk wek pakêtên tijekirina dûbare tên firotin, weke mînak bê pompeya destan.

- **Tamîrkirin li şûna avêtinê:** Kargehên pîşeyan ên ku tamîrê dikin hê jî hene. Wekî din li gelek bajaran tevî Bochumê pêşkeşkirina qehwexaneyên tamîrê zêde dibin. Li wê derê hûn dikarin amûrê xwe yên xirabe di bin rêberiyê de bi xwe tamîr bikin.

- **Rê li ber pakêtên ku gelek caran hatibin pêçan bigrin.** Pakêtên îsrafî  û pakêtên porszonel bikar neynin.

- **Tiştên ku kêm caran an jî ji bo demekê bên bikaranîn, dikarin werin deynkirin an jî kirêkirin.** Amûrên destkarî û makîneyên înşaetê dikarin ji dikana reqalavê, erebel (parvekirina wesayîtan), pirtûk, CD û di demên dawî de jî lîstok dikarin bi heq werin deynkirin.



- **Firseta bexşandin an jî diyarikirina tiştan bi kar bînin.** Platformên diyarî û danûstendinê yên online û her wiha qadên guherandina alavan di rojname an jî înternetê de pratîk in. Rêxistinên xêrxwaz ên herêmî ji bo bexşên bi vî awayî spasdar in. Lê belê çêtir e hûn pêşî bipirsen ka çi û çi lazim e.
- Li Almanyayê qaliteya ava vexwarinê pir bilind e; mirov dikare wisa dev ji şûşeyên avê berde. **Lewra: Ava mislixê di şûna ava şûşeyan.**
- Hewşa kê hebe dikare ciyekî ziblê **amade bike û têde axeke organîk ava bike. Ji bilî wê çopdanka biyolojîk** derfetê bi tenê nade çopa şînkayiyê her wisa dide çopên **organîk jî wekî jibermayînên xwarinê û qacilên sebzeyan, ku werin avêtin.** Ev dikarin li ciyê gaza biolojîk bikarbînin û jê enerjî û ziblê qezenc bikin.
- **Qutiya nanî di şûna kîsê plastîk an jî aluminyumfolyo de bikar bînin.** Li dibistanê, li ofîsê û di seferê de qutiyên nanî pir pratîk in û jîngehê diparêzin û dikarin piştî bikaranînê dîsa werin şûştin û dûbare bikaranîn.
- Pîrozbahiyên we yên taybet û yên kar domdartir in, dema ku hûn firaqên yek carî bikar neyinin û di şûnê de firaqên porselan bikar bênin.
- **Telefonên desta yên kevn mirov dikare diyarî bike yan jî bifroşe.** USB li navendên xwe yên vezivirînbar çopdankê ji bo telefonan amade kirine, yên ku digihînin hevkarên xwe yên karê vezivirînbariyê dikin.
- Mirov dikare rê li ber kirîna bataryayan bigire, dema mirov **şarjên ku dîsa tên tije kirin bikar bîne.**

**Agahî:**

Hemû şênî, sazî yan jî dibistan dikarin li ba USB çalakiyeka paqijkirina bajêr qeyd bikin ji bo hawirdora xwe xweştir bikin. Kesên ku çopê bidin hev wê ji wan re lepik, kîs û amûra berhevkirina çopê bidin dayîn.



Hûn dikarin li ser malpera www.usb-bochum.de xwe bigihînin me



## Para me di pêşîlêgirtina çopan da

USB şirketeka çalak e li Bochumê. Em di gelek beşên jiyana bajarî de dixebitin. Wek nimûne projeya me ya taybet wek dolaba pirtûkan li Bochum-Ehrenfeld (Hans-Ehrenberg-Platz)ê. Di dolabên pirtûkan da yên ku ji aliyê me ve hatine danînin, her kes dikare pirtûkên xwe yên baş ragirtî bihêle û pirtûkên din yên balkêş ji xwe re hilîne, helbet ev yek belaş e.

### Kargeh û çalakî ji bo hemû grûpên temenî

herwisa perwerdekirina zarokên dibistanê û nûciwanan derbarê avêtin û pêşlêgirtina çopan ji me re girîng e. Loma em bi desîplîn kargehan li dar dixin ku ji bo mezinan jî guncaw in.

- çêkirin û lihevanîna paketên materyalan û alavan elektronîk
- Kargehek bi navê „Einmal Faden und zurück“ hat lidarxistin ku têda cilên kevn dihatin guhertin û xweşikkirin.
- Bi xêra eleqeya USB, navenda paqijiya ava bajêr û banka Sparkasseya Bochumê, şagirdên pola yekem di roja yekem a dibistanê de, qutîkên xwarinê û şûşeyên avê wergirtin, ev yek bi mebesta kêmkirina çopan di dema navberdanê da bû.
- USB tevli gelek çalakiyên jîngehparêziyê yên wek roja dirêj a xwezaya bajêr an jî hefteya Ewropayê ji bo pêşîlêgirtina çopan û domdariyê dibe. Di van roj û hefteyên vê mijarê de wek nimûne çalakiyên bilindkirina vezivirînbariyê û paqijkirina bajêr an jî naskirina beharatan tê li dar xistin.

**Agahî:**

USB li gel navenda mafê muşteriyan kargeh û çalakiyan di beşa pêşîlêgirtina çopan û jîngehparêziyê de pêşkêş dike: www.usb-bochum.de/bildungsbereich

## Dayîna termînan ji bo navenda vezivirandinê ya li Havkenscheider Straße




### Kengê termîn pêwîst e?

- Anîna çopa ku ji 2 $m^3$ zêdetir yên ku bi wesayitekê, karavanekê an jî bi rimoqekê dikarin bi tenê li navenda Kornharpen bên dayîn. Ji bo vêya termînek nepêwîste.
- Ji bo çopên bi heq yên inşaatê, çopa tevlîhev ya inşaatê û ji bo çopa malê ev derbasdar e: bi tenê ji bo çopa ku ji 200 kiloyî girantir be termînek pêwîste. Çopa siviktir bê termin bi awayekî giştî li gorî qiyasa volumen li wê derê tê hesabkirin.

Li ser vê kodê hûn raste rast tên ser malpera internetê ya dayîna termina. An jî bi vê linkê www.usb-bochum.de/termine-wertstoffhof-zdk

## Ji kîjan bajaran çop dikare li wê derê were avêtin?

- Bi tenê çopa ji Bochumê tê qebûlkirin!
- Kesên ku çopê tînin pilakeya ereba wan ne ya Bochumê be divê delîlekî bi xwe re bînin û bêyî ku ji wan bê xwestin nîşanî wan bidin weke mînak nasname, kopyaya peymana kirê an jî peymana kirînê.

## Kîjan çop bi heq in?

- Çopên cûda

  Cureyên bermahiyan wek çopa malê, çopa inşaatê, erda ji herî, çopa tevlihev ya inşaatê, materyalên îzolerkirinê, qîr- û kaxezê ji qîrê û çopa asbestê bi heq in.
- Radestkirina çopê ji aliyê bazirganan ve, yên ku dikeve beşa karê wan weke dar, çopa alavên mezin, qutkirina şînkayê û çopa bi madeyên toksîk ji bo wan bi heq in. Li ciyê çopê hûn dikarin bi next an jî bi kerdê bankayê heqê mesrefî bidin.

## Kîjan form dibe ku lazim be?

- Di roja termina radestkirinê de forma tije ya “Nachweis Abfall aus Bochum - Delîlê çopa ji Bochumê” divê bi xwe re bê anîn. Bi taybetî divê agahiyên di derbarê hatina çopê, cureyê çopê, qiyasa çopê û barkêşê bê kirin. Ev agahî divê ji aliyê kesên ku çop çêkirine ve ji bo çop ji kur hatiye çêkirin û ji kesên ku çopê bar dikin ve bê imzekirin.
- Ev ji bo kesên ku çopa radest dikin derbasdare, yên ku taybet termînekê ji bo çopa dar, çopa alavên mezin an jî ji bo şînkayiyên qutkirî, ji bo çopa alavan bê çêkirin.

Ji kerema xwe ji bo pirsîna mesref û xercên çopên bi heqdest, telefonî hejmara Servîs û xizmetê bikin.

**Agahî:**

Forma “îsbatkirina çopan ji Bochumê” tenê ji bo wergirtina termînê bo çopên mezin, dar yan jî şînkahiyan pêwîst e.

# Hûn gelekî bi xêr hatine embarên verzivraindê!

hûn dikarin çopên xwe li gorî qiyasên qeydkirî li şeş navendên vezivirandinê deynin. Hûn dikarin ji bo cihê hêlana çopan li agahiya tabloyê binêrin.

| | Blücherstraße 53 (Wattenscheid) | Am Sattelgut 132 (Linden) | Brandwacht 49 (Werne) | In der Provitze 20 (Mitte) | Schattbachstraße 80 (Laer) | Havkenscheider Straße** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| batariyên kevn | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| batariyên erebeyan | | | | | | ● |
| darên kevn (bêkêr) | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| kaxezên kevn | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| çerxên erebeyan (herî zêde 5 heb), bi çemberên wan ve | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| tekstîlên kevn | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| çopên înşaatê yên tevlihev* | | | | | | ● |
| çopên înşaatê* | | | | | | ● |
| CD DVD, devikên şûşeyan ên darîn | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| Çopên elektronîkî: ocaxên elektronîkî, cîhazên piçûk ên malê, hwd. | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| cam (camên kevn bo konteynera caman) | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| çopên şînkahiyê | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| cîhazên sarker | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| madeyên çêkirina lampeyan | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| Metal û hesin | ● | ● | ● | | ● | ● |
| çopên kêşesaz: lak, reng û hwd.. | ● | ● | | | | ● |
| çopên bermayî* | | | | | | ● |
| çopên mezin heta 2 m³ (bêyî parçeyên elektronîkî) | ● | ● | ● | | | ● |
| mobîliyayên bi parçeyên elektronîkî | | | | | | ● |
| Styromofên pakêtan | ● | ● | ● | ● | ● | ● |
| paketên sivik bi yan bê xalên kesk / sNVP | ● | ● | ● | ● | ● | ● |

*Çopên bi para. Ji kerema xwe ji bo bihayên telefonê bikin. Hemî agahdarî li gorî rêzikên qanûnî yên guherî ne. Guhertin û xeletî ji bilî.
**Agahdariya li ser danîna randevûyekê ji bo bendera navendî dikare di rûpela 28 de were dîtin.



Hûn dikarin li ser malpera www.usb-bochum.de xwe bigihînin me

## çopên kêşesaz

em li van deran çopên kêşesaz di qebareyên biçûk de qebûl dikin:
- Wertstoffhof Havkenscheider Straße
- Wattenscheid, Blücherstraße 53
- Bochum-Linden, Am Sattelgut 132

**di van deman de cihê çopên vezivirînbar vekirî ye:**

| | |
|---|---|
| **Ji duşem heta înê** | **ji saet 7:30 heta saet 20:00** |
| **şemî** | **ji saet 7:30 heta saet 15:30** |

### çopên kêşesaz:

- rûnê kevn
- lampeyên kêmmesref
- foto kîmiya
- lak, helîner
- lîçîng
- lampeyên dirêj
- mehsûlên parastina nebatan
- asîd, asîdên batariyan
- qutîka spreyan
- madeyên paqijiyê yên xurt (wek yên bo paqijkirina kanalîzasyonê)

Her wisa hûn dikarin çopên kêşesaz (ji bilî rûnên kevn) bidin erebeyên jîngehparêziyê. Li vê lînkê hûn dikarin plana hatina wan bibînin **www.usb-bochum.de.**

mirov dikare li navenda vezivirandina fîbreyên mîneral li kolana Havkenscheider bi dayîna mesrefê heta herî zêde 2 m² biavêje.

li navenda vezivirandina Havkenscheider em herwisa bermahiyên înşaatê û kevir-kuçik bi dayîna mesrefê dipejirînin.
**Ev hin sîmbolên nû yên madeyên xeternak in:**


zêde agirgirbar


jehrî


korozîv

Demên vekirî ji bo pîvanê:
duşem heta înê ji saet 07:30 heta 19:00
Şemî ji saet 07:30 heta 14:00
wezinandin tenê kolana li WSH Havkenscheiderê mimkin e.

## dîtineke giştî li embarên me yên vezivirandinê




## pirsên ku zêde tên kirin

**Kî dikare çopên xwe radestî USB bike?**
Embarên me tenê ji bo şêniyên Bochume ne.

**Çopdank her çend deman carekê tên valakirin?**
Çopdankên çopên malê yên bîo û verzivirînbar her 14 rojan carekê tên valakirin. Çopdankên kaxezan her çar heftiyan carekê tên valakirin.




- **Enbarên vezivirandinê**
- Am Sattelgut 132
- Blücherstraße 53
- Brandwacht 49
- In der Provitze 20
- Schattbachstraße 80
- Havkenscheider Straße

- **cihên berhevkirina şînkahiyan**
- Bergener Straße 59

**Xizmetên qismî û tam çawa ji hev tên veqetandin?**

**Xizmeta tam bi vê wateyê ye:**

Hemû çopdankên çopên malê yan jî bîo ji aliyê USB ve ji cihê wan tên birin û dîsa tên vegerandin. Hûn dikarin agahiyên zêdetir li rûpela 4ê bibînin.

**Xizmeta qismî bi vê wateyê ye:**

Hûn çopdankan herî dereng heta 6:00ê şefeqê li ser peyarêyê li aliyê cadeyê deynin, yan jî heger ev ne mimkin be, hûn çopdankan li ber erseya xaniyê xwe ji bo valakirinê deynin. Mesrefa xizmeta tam dikare li gorî daxwazê bi awayekî nivîskî were reservekirin.

Rewş: Tîrmeh/Juli 2023

**USB Bochum GmbH**
Hanielstraße 1 // 44801 Bochum
Tel. 0234 3336-0 // Fax 0234 3336-109

100% FSC www.fsc.org
RECYCLED
Papier aus Recyclingmaterial
FSC® C109513